

Zawand



TÊKOŞER



HEJMAR 31

ADAR 1986



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TEKOŞER: KOVARA TEKOŞER, YEKİTİYA KARKER Ú XWENDEKAREN KURD LI BELÇİKA
NAVNIŞAN: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE
BUHA: 40 F.B., 2 DM, 6 FF.
Nº BANKE: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE
BERPIRSIYAR: M. Nezih YALÇIN
KOMİTA NIVİSKARIYE: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

N A V E R O K

YEKİTİYA KURDAN	Pervîn	R. 3
RÈZIMANA KURDÎ (Dengdar)	Celadet BEDIR XAN û Roger LESCOT	R. 4
GIYAYËN HOV ËN KURDISTANE	YALÇIN	R. 9
HELBEST: SÎ Ú SE GULLE	Ahmet ARIF	R.10
DİROKA KURDISTANE DI ANSİKLOPEDİYA ISLAME DE (IV)	R.12
NEWROZ LI BRUXELLES	R.16
MERİVE NEANDERTAL DI ŞKEFTEN KURDISTANE DE	Fuad HAMA XORŞİD ...	R.17
ALIKARIYA CIVAKA BIYANIYAN	Derwêş	R.20
ROMÎ Ú ŞIVAN	Mihdî	R.22
XEBATA ME	R.23
TEKOŞER'DEN HABERLER	R.23

S O M M A I R E

L'UNITE DES KURDES	Pervine	P. 3
GRAMMAIRE KURDE (Les consonnes) ..	Celadet BEDIR XAN et Roger LESCOT	P. 4
LES HERBES SAUVAGES DU KURDISTAN	YALÇIN	P. 9
POEME: TRENTE-TROIS BALLES	Ahmet ARIF	P.10
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (IV)	P.12
NEWROZ, FETE DU NOUVEL AN KURDE A BRUXELLES	P.16
L'HOMME NEANDERTAL DANS LES GROTTES DU KURDISTAN ..	Fuad HAMA XORŞİD	P.17
L'AIDE SOCIALE AUX IMMIGRES	Derwêş	P.20
LES GENDARMES ET LE BERGER	Mihdî	P.22
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES	P.23

YEKİTİYA KURDAN

Pervin

Gelê kurd ji hezar salan tê pelixandin û kuştin. Ev pelixandin ne bitenê canî, çandî û aborî ye. Ez bawer dikim ku ji aliyê psíkolojîk tesîra vê zordestiyê hîn jî girantir û dijwartir e, û encama (netîce) wê iro li Kurdistanê û li derveyî welêt tê dîtin.

Kurdê serbilind tu bindestî û vegirtin (ısgal) napejirîne (qebûl nake) û dijî wan bê rawestan têkoşînê dide. Loma, hesasiyeta wî pîr tûj e û hergav, bê ku ew pê bihese, ditirse ku têkeve bin destê ne bitenê dijminan, lê yê Kurdan jî!

Ev Kurdê ku êş û birîna laş û canê wî, dîrok û civaka wî şexsiyeta wî pêk anîne, napejirîne ku dîtina Kurdeki din ne weka ya wî be, yan jî ev Kurd weka wî yan jê bêtir pêş ve biçe. Dêlva ku ew bi guhertin û pêşketinan dilxwes bibe, ew tavil (di cih de) rexneyên hişk tîne, yan xwe ji xebatê dişîne û yan jî dijî  dinan derdikeve.

Eger ew bawer be ku xebat di nav rêxistinan de pêwist e jî, di hundirê rêxistina xwe de (ev komel ne rêzanî "siyasî" be jî) piraniya caran dîtinê xwe ji yêñ hevalên xwe çêtir dibîne, û heta ku biryareke hevrayî bê stendin û bi cih anîn di nav endaman de gelek peyvîn ne xwes çêdibin, û yêñ ku newêrin dîtina xwe bêjin jî paşê weka ku dilê wan dixwaze dikan.

Piraniya caran, di nav rêxistinan de, bitenê çend kes ji her tiştî agahdar in û biryaran li gora dîtinê xwe distînîn. Eger tesîra  letiyê (eşîret) di civaka kurdî de pîr kêm bûbe jî, Kurd di xebatê de disiplînê napejirîne. Ew li gora dîtina xwe diçe û pîr caran di paş kesen ku ji malbat, navge yan partiya wî ne dere. Ev girêdana kûr bi malbat, navge û partiyê nahâle ku

zihniyeta Kurd hêdî hêdî fireh bibe û li gora guhertina rewşan û ramanan (fikir) biçe û bikare tehlîla tiştan bê heyecan û bi bêaliyî (bi awakî objektîf) bike.

Em iro hemî dizanin ku bê xebata hevrayî ne bitenê di warê rêzanê de, lê di yê çandî û civakî de jî, Kurd nêzîkî hevdu nabin ku bigihêjin amanca xwe ya yekemîn û dawîn, YEKİTİYE. Dilê me hemiyan jî vê yekê pîr dixwaze û bi rewşa me gelek dêşe, ji bo ku hesta netewî (hissê millî) li ba Kurdan pîr xurt e û ku her Kurd, ji gundiyê ne-xwenda heta ronakbîr, li benda sazbûna yekîtiya gelê me ye. Jixwe ev hesta netewî ne ewqas rast û ges biba, emê ji zû de hunda bibana û di nav Tirk, Faris û Ereban de bihelîyana. Lê mixabin, em dibînin ku daxwazî bitenê têr nake. Eger sûc ê dijmin be û dîroka rêxistinê me ne cuhan be jî, divê em kêmasî û çewtiyêñ xwe venesêrin û ji bîr nekin. Zihniyeta fireh û neguhdana dijminayî û kînên şexsî û rêxistinî gava yekemîn e ji bo yekîtiyê. Eger mercen (şert) jîna me çêtir bibin û hevalên me yêñ biyanî bêtir bibin jî, bê baweriya me bi hevdu û bê dêmokrasiyeke rast di hundir û di navbera rêxistinê me de, em nikarin pêş de biçin.

Eger xwendevan vê gotarê pîr hişk bibînin yan jî nepejirînin, ez hêvî dikim ku ew min bibuhurin. Mebesta (meqsed) min ne nizmkirina Kurdan û rêxistinê kurdî ye. Di vajayê wê de (di eksê wê de), ez bawer im ku gelê kurd xwedîyê rengdêrîn (sifet) pîr dewlemend e û ku wî, bi çand û dîroka xwe yêñ dewlemend û pêşkewt, xwe paraztiye û tesîreke mezin li ser şareyariyê (medeniyet) gelên din kiriye. Lê, weka Kurdeke dilbirîn, min dixwest ku em jî di nav gelên din de cihê xwe yê bilind li cihanê bigirin.

RÊZİMANA KURDÎ

(Zaravê Kurmancî)

- III -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

III. DENGDAR

22. Emê li vê derê rêzkirina kurt ku me di bend 5 de nîşan da bû darîçav bikin.

LÈVÎ: "p" (girtiya kerr, ango dengdara ku coya "kanal" dev digire); "b" (girtiya bideng); "f" (fîkîna kerr); "v" (fîkîna bideng); "m" (girtiya pozî); "w" (dulêviya ajotiya "domdar" bideng).

DIRANI: "t" (girtiya kerr); "d" (girtiya bideng); "s" (fîkîna kerr); "z" (fîkîna bideng); "r" (herikiya lerizî "ricifî"); "l" (herikiya kîlekî); "n" (girtiya pozî).

PÈSEZMANT: "g" (nîvgirtiya xişikî); "c"

(nîvgirtiya xişikî, bidenga "ç"); "ş" (fîkîna kerr); "j" (fîkîna bideng); "y" (nîvdengdêr).

EZMANI Û QIRIKÎ: "k" (girtiya kerr); "g" (girtiya bideng); "q" (girtiya kerr); "x" (ajotiya kerr); "ş" (ajotiya bideng); "h" (ajotiya kerr).

Em ji nuha de darîçav bikin ku dengdariya kurdî tu cêwîbûn (tîpêñ ku du caran têñ nivîsîñ: mm, rr ...) napejirîne (qebûl nake). Li ser vê babetê li dûrtir, bend 63, binêre.

A. LÈVÎ

23. P- Girtiya kerr. Ev dengdar kare cihê "b" bigire. Li benda jêrîn binêre.

Em bala xwe bidin ku di peyvikêñ kurmançî yên Rojhilatê de (Botan, Xerzan, Behdînan, Hêkarf), "b" û çend dengdarêñ din ên ku ewê paşê bêñ dîtin bi qalîndbûneke pirr balkêş têñ bi lêv kirin.

24. B- Girtiya bideng. Li gora lêgerîna li ser rayê "esl" gotinan (étymologie), "b" ya pêşîn (a destpêka gotinê) di kurmancî de cihê "v" ya îraniya kevn distîne.

Nîse: Beziyan (bi avistî: Vaz-: ajotin, bi erebê çûn)(1).

Berf (bi avistî: Vafra-).

Bîr (bi avistî: Vifra-).

Bîst (bi avistî: vîsant-).

Ba (bi avistî: Vaya-).

Beraz (bi avistî: Varâza-).

Baran (bi avistî: Vâr-).

Bê (bi avistî: Vî-).

Nasîna vê cihgirtinê ji bo rêzkirina

(*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Parîs 1970. Wergerandin, fransızî-kurdî: Pervîn.

(1) Gotinêñ îraniyêñ ku di van nîşan de hatine dîtin ji ferhenga Bartholomae hatine stendin. Ji destê me çiqas hatibe me nivîsîna wan ne guhertiye; lê pêwistiyêñ çapkirîne em neçar (mecbûr) hiştin ku em çend rawestêñ (nuqte) wê biguherînin.



دانشکده ادبیات و علوم انسانی تبریز
 مؤسسه تاریخ و فرهنگ ایران

منظمه گردی

شيخ فرخ و خاتون استی

(متن گردی و ترجمه فارسی)

ضبط و ترجمه و توضیح
از
 قادر فناحی قاضی

تبریز، استندماه ۱۳۵۱

انتشارات مؤسسه تاریخ و فرهنگ ایران، شماره ۱۹

zaravêن kurdî bas e. Bi rastî, di vajayê (eksê) kurmancî de, dumilî (zaza) tîpê destpêkirinê yên kevn, "v", dihêle, bê ku wan biguherîne:

<u>Nîše:</u>	Vazdayîş	(bi kurmancî: Bazdan).
Vewr		(bi kurmancî: Berf).
Vîst		(bi kurmancî: Bîst).
Va		(bi kurmancî: Ba).
Varayîş		(bi kurmancî: Barîn).
Verg		(bi avistî: Vehrka-; bi kurmancî: Gur).
Vatis		(avistî: Vak-; kurmancî: Bêje).

25. Cihê "b"ya kurdî kare, di hin rewşan de, ji aliyê "v" yan "p" bê girtin.

a) bi "v". Ev guhertin gelek caran, di çend peyvikan de çêdibe, û bi hêzanî di yên welatê Erih (Botan) û navçeya ku jê re dibêjin Serhedan de, ku awayên weka yên jêrîn bi kar tînin:

Nîše: "Vi" dêlva "bi". "Vê" dêlva "bê".

"Cewav" dêlva "cewab". "Kevanî" dêlva "kebanî".

Di weşanêن Erîvanê de, em cardin van

nîşeyan distînin:

"Ez bivim"	dêlva	"ez bibim".
"Bikari vim"	dêlva	"bikari bim".
"Xirav"	dêlva	"xirab".
"Sive"	dêlva	"sibe".
"Seva"	dêlva	"seba" (ji bo).
"Hesav"	dêlva	"hesab".
"Xevat"	dêlva	"xebat".

Nîsank: Em dibînin ku ev guhertina "b" digihêje gotinêن ku ji zimanên biyanî hatine stendin jî, weka ku di nîşeyen jorîn de gotinêن "cewaw" (bi erebî: جواب, "xirav" (bi erebî: خراب), "hesav" (bi erebî: حساب), nîsan didin. Heta ew, ne bitenê di hin taxan de, lê di hemî peyvikan de, têن dîtin, weka di van gotinan de:

Tevdîr (bi erebî: Tedbîr . تدیر . Bi ser de jî "b" û "d" cihê hevdû distînin).

Evdileziz (erebî: Ebdul Ezîz . عبد العزيز .

Evdilkerîm (erebî: Ebdul Kerîm . عبد الكریم .

b) bi "p". Ev guhertin di hin peyvikên Rojhilate de (weka navçeya Botan) hema herdemî (daimî) ye. Ew bi hêzanî di "b"yên pêşîn de dibe:

Nîše: "Piçûk" dêlva "biçûk".

"Prûsk" dêlva "brûsk"

Di hemî zaravan de "p", bi awakî giştî, cihê "b"ya rayî (eslî), di awayên hevgirtî de xuya dibe:

Nîše: Par "sala buhurî" (ji "behir". Bi avistî: Baxdhra).

Ponijîn (ji bihinjîn).

Pirr giring e meriv zanibe ku ev cihgûhertin, di zimanê îroyîn de, herdem digihêje daçeka "bi", gava ku ew bi pronavekî re hevgirtî be:

Bi vî, bi vê, bi wî, bi wê: hemî dabin "pê"
Bi êk dibe "pêk".

Em di bîra xwe de bihêlin ku ev hevgirtin gelek caran weka pêşdanî têن bi kar anîn.

Nîše: Di peyvikên ku tê de daçeka "bi" "vi" tê bi lêv kirin, hevgirtinêن jorîn dabin: vê, vêk (awayê "vev" pirr kêm e).

26. F- Fîkîna kerr. Piştî hawsêwiya (cîrantî) dengî bi vê dengdarê re, "f" carna bi "v" diguhere. Ev rewş bi van awayan çêdibe:

a) Gava ku "f" di nav du dengdêran de be,

weka di raweyê fermanî (emr) yên lêkerên ku bi "-ftin" diqedin de, weka "hingaftin" (lêexistin, gihajtin) (raweya fermanî: bihingivîne), "axaftin" (baxêve), "ketin" (kurdiya kevn: keftin, kewtin; û kevtin; raweya fermanî: bikeve).

b) Di nav gotinê hevedudanî yan bipaşdanî de, weka "hevdeh" (dêlva heftdeh), "hevsar" (dêlva hefsar), "movik" (dêlva morfik).

27. V- Fîkîna bideng. "v"ya kurdî, bi awakî giştî, weka "v"yeke fransizî tê bi lêv kirin. Lê, di hin navçeyan de (weka li Botan), ew dulêvî ye û dengekî pîrr nêzîkî yê "f" distîne.

"v" roleke pîrr giring di dengdariya kurmancî de dilîze: Em îcar dizanî ku ew gelek caran cihê "b" yan "f" distîne (li bend 25 û 26 binêre). Ji derveyî vaya, ew, di gelek wergerandinan de, cihê çend dengê din ku di rayêن (esl) iraniyêن pêşin de dihatin dîtin distîne. Ev rewş bixwe carna di gotinîne biyanî de, ku kurdî ew stendîne, dibe. Destkewt e (bifeyde) ku em çend nîşeyan li ser van guhertinan bidin:

a) "v"ya kurdî ku cihê "m"ya iraniya kevn distîne:

Nav (avistî: nâmân-, farisî: nam نام).
Xav (farisî: xam پام).
Hev (avistî: hama-, farisiya kevn: hauw, farisiya nuh: hem هم).
Nîv (avistî: naêma-, farisî: nîm نیم).
Zava (avistî: zâmâtâr, farisî: damad داماد).
Gav (avistî: gâma, farisî: gam گام).
Havîn (avistî: hâmin).
Zivistan (avistî: zyam-, farisî: zimistan زیستان).
Zîv (farisî: sîm سیم).

b) "v"ya kurdî ku cihê "b" yan "p"yeke franî distîne:

Sivik (farisî: sibik سبک).
Ava (farisî: abad آباد).
Av (avistî: âp, farisî: ab آب).
Şev (farisî شپ). Lêv (far.: لب)
Nivîsandin (farisiya kevn: nipiştan-nayi, nipiştin نیشتن).
Van (farisî: "ban", ku tê de "b" ji "p" tê).

Nîşank: Di vajayê (eksê) vaya de, meriv dibîne ku piraniya "b"yên destpêka gotinan yêن iraniya kevn di kurmancî de weka xwe mane:

Nîşe: Birin (avistî: bar-).

Bûn (avistî: bav-).

Bext (avista: baxta-).

c) "V"ya kurdî ku cihê "b"ya erebî distîne: Li bend 55 binêre.

d) "V"ya kurdî ku cihê "m"ya erebî distîne:

Civat (erebî: cema'e جاعه).

Silav (erebî: selam سلام).

Dirav (erebî: dirhem درهم).

28. Bikaranîna "v" di rêzkirina zaravê kurdî de taybetiyeke (xusûsiyet) pîrr giring e. Bi rastî, ev dengdara ku di kurmancî û dumilî de pîrr tê bi kar anîn, di soranî de gelek kêm e. Ev peyvik hema bite-nê "w" bi kar tîne; bi ser de jî wê pîrr caran "m" û "b"yên iraniyê kevn (bi hêzanî di gotinê "leb" (lêv) û "em" (ev) de) weka xwe hiştine.

Nîşank I. Di van salêن dawîn de, pêwendiyêن ronakbîriyêن dûbare (ên ku tekrar dîbin) bûn sedema xistina hin gotinê kurmancî, yên ku tê de "v" hene, nav soranî. Hemî van gotinan awayê xwe yê ku di zaravê rayî (eslî) de stendi bûn bê guhertin hişt.

Nîşank II. Di vajayê vaya de, meriv sas dibe ku xelkê Bakur, piraniya caran, sere-navê Başûr ku tê de "w" hene diguherîne û wan "v" bi lêv dike. Nîşe: ew dibêjin "Hev-lêr" dêlva "Hewlêr", û "Şeqlawe" dêlva "Şeqlawe".

Dumilî, weka kurmancî, "v" pîrr bi kar tîne (li bend 27 binêre). Lê, meriv dibîne ku "v"yên dumilî, pîrr caran, "v"ya iraniya kevn dûbar dike (tekrar dike), lê di kurmancî de ne hergav ewha ye. Bi vî awayî jî, yekeminê van her du zaravan bikaranîna "m"yên ku me guhertina wan di zaravê duye-mîn de nîşan da (li bend 27, a, binêre) weka xwe dihêle; nîşeyêن ku me li jor gotin di "zazakî" de di bin awayêن: nam (kurmancî: nav), xam (kurmancî: xav), nîm (kurmancî: nîv), zama (kurmancî: zava), gam (kurmancî: gav), amman (kurmancî: havîn), zimistan (kurmancî: zivistan), sîm (kurmancî: zîv). Ji derveyî vaya, "b"yên iraniyêن ku di kurmancî de dîbin "v", bi dumilî dîbin "w": Aw (kurmancî: av), şew (kurmancî: şev), lew (kurmancî: lêv).

29. M- Girtiya pozî. Tu taybetiyeke balkêş nîşan nade.

30. W- Dulêviya ajotiya bideng. Bi kurmancî "w" pîrr kêm caran di destpêka yan di dawîya gotinan de xuya dibe. Di vajayê vaya de,

meriv gelek caran di cihê duyemîn de, di komên pêşin (ên destpêka gotinan) ên dengdaran de, rastî wê tê. İcar di dû wê de dengdêrek, "a", "e", "ê" yan "î", tê û weka ku emê dûrtir bibînin (bend 70 û yên piştî wê), ew hevdu digirin. Lî, em bala xwe bidin ku "w", gava ku piştî wê "x" hebe, dijî hundabûnê xwe radigire (xwe diparêze).

Ajotina (dewambûn) vê koma dengdariya îra-niya kevn, "xw" (ku bi farisi "w"ya wê nema tê bi lêv kirin), yek ji taybetiyê fonêtika kurmancî ye (fonêtik: nivisîna tîpan li gora dengên ku ji wan tê).

Nîşe: Xwedê, xwe, xwê, xwarin, xwestin, xwar û hwd.

Nîşank I: Jînyariya "xw"ya kurdî ewqas xurt e ku carna "w" piştî "x"yên gotinêni biyanî xuya dibe.

Nîşe: Xwal (erebi: xal خال).

Xwerdiyan (dergevan: bi fransizî: gardien).

Xwermûf (erebi: xermûb خرموب).

Nîşank II: Lî, divê meriv carna bala xwe bide ku di peyvikên Rojhilatirîn de (çiyayê Kurdan, navçeya Malatya û Urfê) "w", deng-dara duyemîn, heta piştî "x" jî hema bica-rek hunda bûye:

<u>Nîşe:</u>	"xo", "xa"	dêlva	"xwe"
	"Xastin"	dêlva	"Xwestin"
	"Xarin"	dêlva	"Xwarin"

31. "W" nikare ne di paş û ne di pêş "u" de were. Loma me rêzika (qaide) wê di bend 19 de nîşan da.

Nîşank: Nêşşa (tablo) bend 55 ewê nîşan bide ku bikaranîna "w" di soranî de ji kurmancî gelek bêtir e. Sedema vê taybetiyê ev e ku di yekemîna van her du zaravan de "v" tu neye.

B. D I R A N I

32. T- Girtiya kerr. "T" di rewşen jêrîn de ber bi hundabûnê diçe:

a) di dawiya gotinan de. Ev rewş bi hêzanî di dawîneya lêkerî "-it" de, kesê siyemînê yekejmar, ku di piraniya peyvikan de hunda bûye û ku bitenê di çend navçeyan de maye (nîşe: Botan, Behdînan) dibe.

Nîşe: "Dibêje" dêlva "dibêjit".
"Diçe" dêlva "diçit".

Ü bi vî awayî jî, "got" (kesê 3minê yekejmar, dema borî ya "gotin"), bêtirîn caran, "go" tê dîtin.

b) Di nîşanên raderî "-tin", ku bi "-în" hevgirtî ne, de.

Nîşe: "Herifîn" (hilwesan) dêlva "heriftin".
"Dîn" dêlva "dîtin".
"Nihêrîn" dêlva "nihêrtin".

c) Di nav gotinêni hevedudanî de:

Nîşe: "Desgeh" (alet) dêlva "destgeh".
"Desgirtî" dêlva "destgirtî".
"Fekirîn" (nêrîn) dêlva "fetkirîn".

Li ser guhertina "t" bi "d", li benda jêrîn binêre.

33. D- Girtiya bideng. Taybetiya "d" ew e ku di awayê hevgirtî de dibe "t"ya kerr. Bi hêzanî gotinêni jêrîn vê guhertinê dibînin:



Nîşe: "Tê" dêlva "di vî", "di vê", "di wî", "di wê".

"Tev" dêlva "di hev".

"Têk" dêlva "di êk".

Nîşank: Awayên "tê", "tev", "têk", pirr caran weka pêşdanî têñ bi kar anîn. Em bala xwe bidin ku dema ku pêşdaniya "di" di rêsayê (ma'na) "ê" de tê, weka di "hespeki di Soro" de, ew nema kare xwe bi pronav bigire. Divê meriv bêje "hespeki di wî": "Hespeki tê" bê rêza dimîne. Di vê, rewsê de, "di" kare bitenê di pareka besa duyemin a ragihandinê de hunda bibe, û besa dawîn tucar naguhere.

Nîşe: "Hespêt wî" dêlva "hespêñ di wî".

34. S- Fîkîna kerr. Pirr caran, "s", piştî dendgarekê, "z" tê bi lêv kirin.


Nîşe: "Derbaz" dêlva "derbas"

"Ozman" dêlva "Osman".

"Bibihîze" dêlva "bibihîse".

"Dezgirtî" dêlva "desgirtî" (ji destgirtî).

Nîşank I: Wesanên kurdî yêñ Erivanê pirr caran tipa "z" di gotinêñ weka yêñ jorîn de bi kar tînin. Ji bo ku ev yek cihêtiyeke piçûkeke tesadufî ya bilêvkirinê ye, çêtir e ku em bi "s" dewam bikin.



Nîşank II: Di besa rojavayî ya kurmancî de (Botan, Xerzan û hwd.), "s" bi mebestî (bi qesdî) stûr dibe, weka ^wa erebî. Loma, meriv hin awayêñ weka "sund" dibîne (li bend 12 binêre).

35. Z- Fîkîna bideng. Em stûrbûna "z" li Rojhilatê, piştî guhertinêñ "p" û "s" ku di van peyvikêñ ku me li jor dîtin de, nîşan bidin.

"Z"ya kurdî carna dibe weka "s", yan "ş"ya İraniya kevn, yan a farisî.

Nîşe: Zîv (bi farisî: sîm ^{pew}).

Pez (avistî: pasav-).

Zik (farisî شک).

Nîşank: Dengê "z" di dumilî de ji di Kurmancî de gelek bêtir e (li nexşê, bend 55, binêre).

36. R- Herikiya lerizî. Li kêleka "r"ya xwederî (tebîî) ku taybetiyêñ wê îcar hatîne nasîn, di kurdî de "r"yeke pirr xurt heye ku meriv bi awakî istisnaî di çend gotinan de rastî wê tê, lê ku alfabe wê nanivise, ji sedema kêmbeña wê. Her du nîseyêñ xuyatîrîn ev in: kirîn, birîn.

Em dibînin ku bilêvkirin û nivîsîna van her du lêkeran, ji derveyî "î", weka "kirin" û "birin" in; û bi ser de jî, ew weka wan, di çend deman de têñ kesandin. Ev rews weka ya "k"ya hişk ku emê paşê bibînin (bend 46) e.

37. Em dikarin gelek nîseyan li ser guhertina "r-l", ku hem di nav û hem di dawiya gotinan de dibe, bidin:

"Kelmêş" dêlva "kermêş" (ango, mêşa keran).

"Şelît" dêlva "şerît" (ji erebî شریط).

38. L- Herikiya kêlekî. "L"ya kurdî bicarek weka ya fransizî ye. Lê, di peyvikêñ Rojhilatê û di soranî de, "l"yeke dineke stûr û weka ya rûsî, li kêleka "l"ya xwederî (tebîî) xuya dibe.

Guhertina "l-r" qasî ya "r-l" pirr e.
Nîşe: "Şalûr" dêlva "şalûl"

"Arguşk" dêlva "alîguşk"

Di vê babetê de, em bala xwe bidin ku hin gotinêñ ku tê de girêdanekî ahengî yan hevgirtin heye, carna "l" û carna "r" dissitînin.

Nîşe: "Cebilxane" yan "cebirxane" (ji tir-kî: cebhane).

"Sîlebend" yan "sîrebend" (ji sînge-bend).

39. Ketina "l" pîr kêm e. Lî giring e ku em nîşeyeke taybetiyeke naskirî nîşan bîdin. Ev jî daçeka "li" ye ku, di hin rewşan de, xwe bi "-î" digire û bi gotina ku tê pêşıya wê yek dibe. Nîşe: Tevî (tev li).

40. N- Girtiya pozî. Xuyabûna "n"yeke ahengî di gotinê hevedudanî de pîr dibe.

Nîşe: Seranser, beranber, spîndar yan dar-spî (spî + dar).

Ketina "n" bi hêzanî di dawiya gotinan de dibe.

Nîşe: "Mi" dêlva "min".

"Yê" dêlva "yên".

"Hespê min" dêlva "hespên min".

"Gunda" dêlva "gundan".

Nîşank. "N"eya dawîn a pareka nebinavkirina gelejmar "-in" û "n"eya dawîneyêne gelejmar, "-in", "-iyan" û hwd., di kesandina lêkeran de, tucar nakevin.

Rewşikeke weha di peyvikeke tenê de, ya Botan, ku tê de dawîneya lêkerî ya gelejmariyê, "-in", xwe bi "-î" digire, tê dîtin.

Nîşe: "Em ketî" dêlva "em ketin".

"Hon rûniştî" dêlva "hon rûniştin".

"Ew hatî" dêlva "ew hatin".

Dûmahî heye

GİYAYÊN HOV ÊN KURDISTANÊ

-//-

Berhevkirin: YALÇIN

Di hejmara me ya buhurî de, me navêngiyayêñ Kurdistanê ku ji ber xwe, bê çandin, şîn dibin nivîsi bûn. Nuha jî emê navêngozzanêñ ku ew tê de şîn dibin nîşan bidin. Bi ser de jî, emê navêng êlêñ (eşîr) ku wan li van zozanan diçinîn (berhev dîkin) bêjin.

Gelek ji van giyayan di xwarinêñ kurdî de cihekî giring distînin. Nîşe: Ev êl sîrikan dixin nav penîr û xwarinêñ ku ji şîr çêdibin û wan li deştan difiroşin.


Sîrika pehn li nizanan (daristan), banan û berçeman şîn dibe.

NAVÊN ZOZANAN

- | | |
|----------------|-------------------|
| 1) Arû | 10) Mehîna |
| 2) Dubirak | 11) Meydan Casûs |
| 3) Duguuhga | 12) Mila Mêrgê |
| 4) Fereşîne | 13) Mila Sirmî |
| 5) Helukolik | 14) Pala Mamê Mûs |
| 6) Kanîkilê | 15) Şaxa Hekarî |
| 7) Kelha Berge | 16) Şkêrgînê |
| 8) Kelha Hêg | 17) Xara xirû |
| 9) Kêla Memê | 18) Xelat |
| | 19) Wanê |

NAVEN ELAN

- | |
|-------------|
| 1) Ala |
| 2) Ezdîna |
| 3) Gewa |
| 4) Mam Xura |
| 5) Şerefa |
| 6) Şîda |
| 7) Xawîsta |
| 8) Xêlîka |
| 9) Zêwga |



Sîrik

SÎ Û SÊ GULLE

Ev çiya çiyayê Mengenê
 Gava şevaqê lêxist li Wanê
 Ev çiya biçukê Nemrûdê
 Gava şevaqê lêxist hember Nemrûdê
 Alîyek min berf digre, hember Qefqasan
 Alîyek min seccade, milkê Kurdan e
 Li serî da guşiyên cemedê
 Li ser avan kevokên revok
 Kerîyên xezalan,
 Ü refê kewan...

Mêrxasî nayê îñkarê
 Di şerê yek û yek da qet neketin bin
 Ji hezar salan vir da zilamên vir
 De em gi bêjin lo!
 Refê qulinga nîn e ev
 Nîn e li ezman koma stêran
 Dilê bi sî û sê gule
 Sî û sê kanîyên xwîn
 Naçe,
 Gol bûye li vî çiyayî...
 Ji bin palê kewroşkek rabû
 pişt belek
 Zik çîl-sipî
 Kewroşkek çîyê
 Xerîb û ducanî,
 Dil di dest da, ûsa reben
 Meriva poşman dike bi xwedê
 Demek ker, xalî bû her der
 Şevaqek tip û tazî û çîksayî bû
 Nihêrt ji sî û sisîyan yek
 Bi zikek birçî û vala
 Rih û por bûye bostek
 Di pêşîrê de sipiyek,
 Nihêrt bi milên girtî,
 Mêrxasekî kezepola,
 Carek li kewroşkê,
 Carek jî pa ra

Ket bîra wî fîlînta delal,

Ku xeyîdî bû di bin balîfa wî,
 Ket bîra wî,
 Canûya ku anîbû ji deşta Heran
 Enî morî hêşîn
 Ü bes,
 Sê sim sipî,
 Beza û tolaz û reqsok,
 Mehînek qemer û seklawî.

 Çilo firîbûn li ber Xozatê!
 Niha, wilo bêçare û destgirêdayî
 Ü li pişt wî lûleka sar
 Ger nebûwana,
 Dikaribû xwe bavêje bilindahîya,
 Ev çiya ji wî ra yar in, qedrê wî zanîn
 Destêن wî, bi destanî xwedê, wî rûrêş nakin
 Ew destêن hoste ku
 Lêdixe di yek carê da
 Xweliya cixarêن vêketî,
 Ü zimanê marê gewr
 Ku bin tavê da mîna çîkekî dubend e...

Van çavan, tu caran nehatin xapandin
 Ev çavêن ku gelek berê dibînin
 Qiymeta gelîyên ku li benda çixan
 Kaşêن bi berf û nermok
 Ü bêbextîya şaxuran...
 Bêçare
 Ew dê bihata lêdan,
 Ferman pêwîst bû,
 Edî bila marzerikê kor bixwin çavêن wî
 Ü dilê wî teyrê beretan...

Ez hatime lêdan
 Li gelîke xalî, li çîyan
 Dem-dema nimêja sibê
 Ketî bûn
 Nav xwenê de dirêj bûbûm...

Ez hatime lêdan

Xeyala min ji şevan tarîtit
Kes napirse halê min
Can ji min digrin bê ecel
Nîn e li tu kitêban
Şîfre şandîye paşakî
Hatime lêdan bê mehkeme, bê pirs

Kirîvo, rewşa min ûsa binivîse
Dibe rîwayet bêjin
Ev memikê gul nîn e
Di devê min de kerî kerî
Lê guleyê waşa ne...

Fermanê kuştinê anîn cih,
Mijê çîya ê hêjîn
Û bayê sibê, hînik û sifîk
Nav xwînê da hiştin.
Û pêra li wir tifing spartin
Li bin çengê me hûr hûr nihêrtin
Û lê gerîyan,
Piştâ mina sor, malê Kîrmansahê,
Tizbî û qûtiya zîvîn
Girtin û çûn
Hemû jî diyarî bûn ji Acemîstanê...

Em kirîvin, mirovên hevin û pincarê çîyakî
ne
Bi gund û mezrên hember re
Em xinamîyê hevin ji sedsalan vir de,
Cîranê hev û du ne
Mirîşkê me tevlihev dibin
Ne ji nezanîyê,
Ew e curma kuştina me,
Ji bo wê navê me eşqiya ye
Isatvan
Rêbir
Û bêbexte...

Kirîvo, rewşa min ûsa binivîse
Dibe rîwayet bêjin

Ev memikê gul nîn e
Di devê min de kerî kerî
Lê gule yê waşa ne...

De lêxin lo,
lêxin,
Bi hêsanî nayêm kuştin.
Kuçkê min de hîn agirê venemirî,
Û ji were çend gotinê min hene
Ji mirovên fama re.
Bavê min çavêن xwe dan li ber Ruhayê
Û, sê birayêن xwe
Sê tayêن ciwan,
Wek sê çîya bûn, ji minaran,
Gava hember Fransiz şer dikirin,
Kirîv bûn, pismam bûn, xwedî eşîr bûn
Xalê minî biçûk, Nezîf
Simbêlêن wî hîn xwehda bûn
Delal,
Sivik
Û siwarekî baş
Gotiye lêxin birano
Roja mîran e
Û hespê xwe rakirî ye ser pîya.

Kirîvo, rewşa min ûsa binivîse
Dibe rîwayet bêjin
Ev memkê gul nîn e
Di devê min de kerî kerî
Lê gule yê waşa ne...

AHMET ARIF

(Helbestêن Kurdi
Weşanêن Ronahî)

DÎROKA KURDISTANÊ DÎ

- IV -

B. Dema İslami heta 1920

V E G I R T I N A T I R K I

O X U Z

Gava ku di 420/1029 de Oxuz, pêşiyên Selçûkiyan, gihajtin Ray, generalê tirk ê Kaznawîyan, Taş Farraş, tevî 3000 siwarên ku di nav wan de Kurd hebûn çû ber wan. Serokê van Kurdan, ku ji aliyê Oxuzan hat girtin, ji zilamên xwe re nûçe şand ku şerr rawestînin. Vê yekê ew perişan hiştin û Taş hat kuştin (Ibn El-Esîr, IX, 268). Di wê salê bixwe de, Oxuz gihajtin Maraga û gelek Kurdên Hazbanî kuştin. Kurd bûn hevalbendên waliyê Azarbayanê (Wahsûdan II) û Oxuz neçar (mecbûr) man ku paş de vegerin. Beşike din a Oxuzan jî, piştî talankirina Ermenistanê, vegeriya Urmiyê û erdên Ebûl Hayca' Hazbanî; Kurdan êrîşî Oxuzan kirin lê hatin şikestin. Di 432/1041 de, Wahsûdan II Ibn Mamlanê Musafirî li Tebrîzê gelek Oxuz kuştin; Oxuzêne Urmiyê derbas bûn Hekkari, ku girêdayî Mûsilê bû, û welêt talan kir, lê gava ku ew ketin nav çiyê, Kurdan êrîşî wan kirin, 1500 zilam kuştin û gelek girtî û destkewt stendin (berhem "eser" bixwe, IX, 270-2).

Bi nêzîkbûna leşkerên Turgil Beg, Oxuz bi tirs pêş de çûn. Rehberên Kurd ew ji navçeya Zozanê, li Cezîrê, derbas kirin. Beşek ji Oxuzan, di bin serokatiya Mansûr Ibn Gozuzählî, li Rojhilata Cezîrê ma, û beşa din, di bin Bûka de, çû ser Diyarbekrê û, di rê de, navçeyen Kardû, Bazabda, Huseynîye (Yaqût, II, 270: bajarek di navbera Mûsil û Cezîrê de) û Fayşabûr talan kirin. Suleyman Ibn Nasr El-Dewleyê Merwanî, waliyê Cezîrê, ji Oxuzan soz stend ku li benda beharê bimînin, berê ku ji welatê wî derbas bibin, ji bo ku bigihêjin Oxuzêne ku ji berê li Sûriyê bi cih bûne. Paşê, bi saya lîzekî, wî Mansûr stend, û bi alîkariya Kurdên Başnawî yêñ Finîkê, di dû Oxuzan de çû. Lê, evêñ dawîn, dev ji têkdanê (xera kirin) berda, navçeya Diyarbekrê talan kir û Mûsilê stend (berhem bixwe, IX, 272-3).

Di vê demê de, samana (serwet) Hesenweyhiyan hilweşıya bû, û hikmê Cibal keti bû destê malbateke nuh, Benû Annaz, ku bêtir bi navê Ebûl Şewq hatiye nasîn (li Sachau, Ein Verzeichnis Muham. Dynastien, 19; Serefname, I, 22: Ayyar binêre). Hîn di 340/951 de, di dema serhildaneke tirkî de, li Hamadanê, Mu'iz El-Dewleyê Bûyid alîkariya Ibn Ebil Şewq, serokê Hilwanê, stend (Tecarib, II, 2). Hîmdarê rast ê vê malbatê Ebûl Feth Muhammed Ibn Annaz, ku ji 380 heta 401 hikm kir, xuya bû (Ibn El-Esîr, IX, 158). Lawê wî, Ebûl Şewq, Hesenweyhiyê dawîn, Zahir (Tahir), di 406 de kuşt. Ji zewiyê (erd, hebûn) Benû Annaz, Şehrezor, Kermanşah (ku di 431 de hati bû vegirtin; berhem bixwe, IX, 300, 316), Bîlawar, Samxan, Dakûka, Xuftizakan hebûn. Di 437 de Turxîl birayê xwe İbrahim Inal şand Cibal ji bo kuşerrâtê de rawestîne. İbrahim ji Hamadanê Garşaspê Kakûyî, ku li ba Kurdên Cûzkan penaber (multecî) bû, qewirand. Li Kermanşahê, komeke leşkerên Ebûl Şewq, ku ji Daylamî û Kurdan hati bû pêk anîn, hebû. Kermanşah hat vegirtin û Ebûl Şewq di 438/1046 de li Sirwanê mir. İbrahim Samiran (Şamiran? Saymara?) stend û Cuzkan hikm kirin. Sa'dî, lawê Ebûl Şewq, xwe xist bin destên Selçûkiyan. Ev malbat heta 510/1116 ajot (Müneccimbaşı, Sachau). Şikestina imperator Romain IV li Malazgerdê (463/1071) hemî Ermenistanê xist bin Alp Arslan. Di bin Selçûkiyên mezin de, li Farisistanê malbata ajawe (ne bêdeng) ya Şabankara ji nişka ve xuya bû. Lê pîr bigûman e ku ev êla ku di navbera 421 û 756 de hebû bi rastî Kurd bû (li jor binêre). Ji alîkî din jî, malbatê kurdiyên piçûk bi hişkî, ji bo Tirkan, dihatin hunda kirin. Di 493/1100 de, Merwaniyê dawîn li navçeya Xilatê hunda bû. Di vê navçeyê de, Sukman Kutbiyê Tirk qraliya Şâh Arman ku sedsalekê, heta hatina Eyyûbiyan, ajot ava kir. Di 495/1101 de, Ibn El-Esîr (X, 238) kuştina 2000 Kurdên Surxab Ibn Bedr, zaro-kên qraliya Benû 'Annaz, ji aliyê Tirkmenêñ

(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin, fransızî-kurdî: Pervîn.

ANSİKLOPÊDİYA İSLAMÊDE (*)

Karabuliyê Salgûrî nîşan dide; ev Tirkmen, paşê, hemî zewiyê Surxab, ji derveyî Şehrezorê, Dakûka û Xuftizakan stendin. Li gel van paşdemayıyan, Kurd pirr caran di sedsalên Vmîn û VI/XI/XIImîn de hatine nîşan dan. Di şerrê xwe dijî Kawurdê Kirman de, Malik Şah hêzên kurdî û erebî bi kar anîn û paşê erdina li Kirmanê, ku tê de ji berê komên kurdî hebûn, weka xelat dan wan (li El-Mes'ûdfî, Tenbîh, 88; Ibn Xallikan, I, 516 binêre). Talanên kurdiyêن cihê li Duceyl, Mêrdînê û hwd., di 496, 498, 503 de, çêbûn. Di dema şerrê Muhammed Ibn Malikşah dijî Sûriyê de (504/1110), serokê Marga, Ahmadil Ibn Wahsûdan, Kurdek ji êla Rewadî (li Ibn El-Esîr, X, 391 binêre) û "şahê Ermenistanê" Sukman beşdarî wî bûn. Ev şerr hat şikestin û Kurd çû dorgirtina Sukmanê Tirk (Recueil des Histr. des Croisades, Docum. Orientaux, III, 542, 599).

Di wê çaxê de, bêtirîn caran li ser Kurdêن Sûriyê ku pêwendiyêن wan bi Fransa re hebûn dihat peyivîn (li Derenburg, Usama Ibn Munqiz binêre).



Efserek (zabit) ji Suleymaniye

Di bin Sancar de, wilayeta ku jê re "Kurdistan" dihat gotin ji beşa rojavayî ya Cibal ava bû bû. Suleyman, biraziyê Sancar, bû waliyê wê û paytexta wê bû Bahar (li Rojhilata Bakurê Hamadanê). Ev wilayet pêşkewt (şîn, dewlemend) bû. Cardin di bin Sancar de, Kurd beşdarî serhildanêن 513 bûn; di 516 de, leşkerek li Hekkarî, Zozan û navçeya Başnawî geriya (berhem bixwe, X, 374, 377, 426), lê hinek sün de Kurdan li Tûr Abdînê kela Patrîkê fille stend (Assemani, Bibl. Orient, II, 221).

ATABEGEN MUSILE

Atabegên Mûsilê, nêzîktirînên hawseyên (cîran) Kurdistana Navîn, tê de roleke giring lîzt. Gelek caran, Imad El-Dîn Zengî erdê kurdî vegirt. Di 528/1134 de, wî Tanza (li ser kêleka çepê ya Boxtan) stend û, ji bo sezadana (ceza kirin) Humeydiyêن ku di dorgirtina Mûsilê de piştâ xelîfe Musterşid girt, kelên wan, El-Akar, Şûş û hwd. (Şems El-Dîn, di Recueil, III, 666-7 de; Ibn El-Esîr, El-Tabakîyye, berhem bixwe, II, 87). Ebûl Hica', serokê Erbil, Asib û hwd., ket bin destê Zengî (dibe ku navê wî Hekkarî bû; ev êl di wê demê de li Başûrê erdê ku iro vî navî distîne rûdînişt; li Hoffmann, Auszüge, 203 binêre). Piştî mirina Ebûl Hayca', Zengî xwe xist nav pevçûnên paşiyêن wî, Aşîb stend û têk da; kela Celab navê Amadiya (= Imadiyya, di şefera Imad El-Dîn de) stend. Di 534/1139 de, Zengî Şehrezorê ji Kifcak Ibn Arslan Taşê Tirkmen stend. Di 537/1142 de, wî serê şerrekî nuh dijî Hekkariyan kişand û kela El-Şâ'banî (= Aşîb?) stend û ji nuh de ava kir. Di 538 de, Irûn û Xîzan hatin stendin (Şems El-Dîn, di le Recueil, III, 685 de). Elî, serokê El-Rabiya (li Serefname, I, 284 Rabiya-Bulak binêre), Farah û Alka (Elk?), ji ber xwe hat ba Zengî. Şerrê dawîn ê Zengî dijî Başnawiyêن Fanak (Finik) bû, lê dorgirtina vî bajarî piştî mirina Atabeg rabû (541/1146, Ibn El-Esîr, El-Tabakîyye, di le Recueil, II, 86, 114, 129, 188 de). Karaca Tacna, "mukta'(?)"yê Hekkarî, ku di 547 de ji aliye Atabegê Mûsilê dijî yê Azarbayanê hati bû şandin, Tirk û ji êleke biyanî xuya bû.

Derengtir, piştî mirina Selaheddîn (589) Zengîyan rewşa xwe li Kurdistana Navîn xurt kir. Di 607/1211 de, ji Imad El-Dîn re, lawê piçûk ê Arslan-Şah Zengî, kelên Humeydiyan (Akr û Şûş) weka erd hatin


dayîn; di 615/1218 de, ew mîr bixwe Amadiya "û bermayıyê kelên Hekkarî û Zozan", ku ji aliyê Muzaffer El-Dîn Köküriyê Erbîlî hati bûn hiştin, stendin (Ebûl Ferec, 433, 438). Dibe ku van bûyeran Hekkarî neçar (mecbûr) hişt ku vegeerin navçeyên hawsê (cîran) ên kaniyêن Zabê Mezin.

ARTÜKİ, ATABEGEN DIYARBEKRE

Artûkiyan gelek caran bi Kurdan re şerr kir (Ebul Fida', III, 583; Usama, I, 32). Xelîfîn Abbasî ji bandora parêzîn xwe azad bûn û bi Kurdan re pêwendiyân kirin (li rewşa Isa Humeydî di 528 de û li Ibn El-Esîr, XI, 7, 188 binêre) û tecrûbe kir ku Tirkan qels bikin. Di 581/1185 de, di bin El-Nasir de, bûyerek piçûk şerrekî di navbera Kurdan û Tirkmenan derxist (berhem bixwe, XII, 342). Ev şerr li ser erdekî mezin (Sûriye, Diyarbekir, Cezîre, Mûsil, Şehrezor, Xilat û Azarbayan) fireh bû. Du meh şûn de, nahezan dev ji lihevxitina hevdu berda ji bo ku bi hev re dijî Fille-yêن Ermenistan, Aşûristan, Mêzopotamya, Sûriya û Kapadokyê şerr bikin; lê dubendiyêن nuh Kurd û Tirkmen ji hevdu vegetandin. Piştî gelek şerrîn xwînî, Kurd vege riyan heta Kîlîkya. Tirkmenan nêzîkî tevayiya Kurdîn Kîlîkya û Sûriyê ne hiştin. Ji bo ku Kurdan, dema ku cihêن xwe yên kevn berdi dan, hebûnêن (milk) xwe ji hawsêن (cîran) xwe yên fille re dihiştin û ku Fillehan Kurd vedîşartin, di dawiyê de, xwe diavêt ser Fillehan, li Selmuzen (?) û Arabsil (= Arabgir?) (Michel le Syrien, Recueil, Doc. Armén., 395).

EYÜBİ

Rayêن (esl) kurdî yên vê maliya qraliya giranbuha xuya ne (Şerefname, I, 55-82). Dîrokzanê ermenî Hayton (Hethum) li ser wê ewha dibêje: "Paşê Ereban hikmê Misrê hunda kir û Medan, ku ji wan re adeta Korden dibêjin, hikmê Misrê stend". (Recueil, Doc. Arm., II, 225, 343). Kalê Selah El-Dîn, Şazî Ibn Merwan, Kurdeki Rawadî bû. (Rawadî, Rawanda, malbatek ji Hazbaniyan) ji Dwîn. Rastiya giring ev e ku ji Dwîn malbata qraliya Şeddadiyan, ku adetên wê di dema Şazî de pirr jînyar bûn, derket. Eyyûb û Şîrkûh, kurêن Şazî, di niştimana kevn de (li gundê Acdanakan) çêbû bûn. Salah El-Dîn li Tekritê çêbû, lê bîreweri yêن kurdî, bi saya bav û apê wî, jê re nêzik bûn (li El-Fariqî, di Ibn Kalanîsî de, weşana Amedroz, s.a. 55 binêre). Ajotina bikaranîna navêن ûranî di malbata Eyyûbiyan de balkêş e. Lê xebata qralî bi hêzanî li Sûriyê û li Misrê fireh dibû. Malbatên Atabegêن Selçûkiyêن kevn, heta gava ku di bin hikmê Eyyûbiyan de bûn, di hikmkiri-



Çiyayê Nemrûdê

nê de, li Diyarbekrê (Artûkî), li Mûsilê (Zengî) û li Erbilê (Begêñ Tagînî, ku di destpêkê de bitenê nûnerêñ Zengiyan bûn) dajot. Di peymana 585/1187 de, bi Izz El-Dîn Zengî re, Salah El-Dîn bitenê Helebê û Şehrezorê ragihandin (Ibn El-Esîr, El-Etabekîyye, di Recueil, II, 334, Kamil, XI, 340 de; Ibn Şeddad, di Recueil, III, 85 de). Di 585 de, Salah El-Dîn Şehrezorê da Memlûkê xwe Keştoxdî (?), merivê Ya'qûb Ibn Kifcak. Xêza serbixweya sereke (bitenê) ku pê re Eyyûbî ketin Kurdistanê ya Xilatê bû. Ev navçe di destpêkê de ji aliyê Teqî El-Dîn, di 587/1191 de, hat vegirtin (Ibn El-Esîr, XII; 40). Lê, bitenê piştî mirina Salah El-Dîn, birayê wî El-Malik El-Ewhed Necm El-Dîn Eyyûb, di 604/1207 de, tê de rûnişt. Paşê, Xilat ket bin destê birayê wî Eşrefê ku sernavê "Şah Arman" stend, û di dawiyê de, ew ket bin destê birayê siyemîn, Muzaffer, ê ku heta 642/1244 tê de ma. Hikûmeta vî erdi ji aliyê vegirtinêñ Gurcizan, ên Xwarazmşah û Mogolan çend caran hat rawestandin. Leskerên Gurciz ku, di wê demê de, li dora Xilatê şerr dikir, ji aliyê mîrîn ermenî Zakar û Iwan, ku darêñ rayên wan wan ji Xel Babirakan, ango ji êla kurdî Bapîrakan nîşan didin, hati bûn hikm kirin. (Li Marr, di Zap., XX "1911", 120 binêre).

Leskerên Eyyûbî bi hêzanî ji Tirkan hati bûn pêk anîn, lê regezê (unsur) Kurd jî tê de ne piçûk bû. Di 583/1187 de, Salah El-Dîn bangî Kurdîn piştî Diclê kir ku biçin Cihadê (şerrê muqeddesê islamî). Leskerên Cezîrê di 584/1188 de hatin berdan, lê yên Diyarbekrê û êlîn taybetî (xusûsî) pirr caran têñ nîşan dan. Gelek

caran, navbera van Kurdan û Tirkmenan ne baş bû (Ibn Şeddad, Recueil, III, 86, 313, 381).

Kurd di sazendeyêن (muessese) şarî (medenî) û leşkerî yên Eyyûbiyan de pirr bûn, lê gelek caran dijî tevgera malbatê derdiketin. Gava ku Şérko mir, hin Kurd hebûn ku dijî stendina hikm ji aliyê Selah El-Dîn derdiketin (Ibn Xallikan, IV, 494). Roleke girin ji aliyê malbata Ebûl Hayca' (Hazbanî), serokê Erbilê (?), hat lîztin. Wî berengariya (xweparaztin) Akka ku ji aliyê Xaçîyan hati bû dorgirtin ajot û weka "isfahalarê" leşker û waliyê Qudsê hat te'yîn kirin. Di 1196 de, ew hat şandin Begdadê, şerrekî li Hamadanê ajot û li Dakûka mir. Biraziyê wî, Kutb El-Dîn, medresa (dibistana olî) El-Kutbiyya li Qahirê ava kir. Kurdekî din, Seyf El-Dîn, kurê Ehmed El-Meştûb, ji êla Hekkarî, cihê Ebûl Hayca' li Akka stend. Neviyên wî jînên ajawe (ne bêdeng) derbas kirin: Kurê wî Ehmed rojêñ xwe di girtîgeha Harran de qedand; neviyê wî Qazî Imad El-Dîn dijî El-Kamil planekî çêkir û ji welêt hat qewi-randin.

XWARAZMŞAH CELAL EL-DİN


Di 614/1217 de, Kurdên Zagrosê leşkerên Xwarazmşahê ku ji Hamadanê hati bû şandin Begdadê şikandin. Şerrên Celal El-Dîn dijî Xilatê (623-6) jîna welêt tevlihev kir, û Kurd ji birçiyetiye (nexweşıya birçîbûnê) mirin (Ibn El-Esîr, XII, 207, 308). Mogolan li Celal El-Dîn xist û ew di dû wî de gün. Celal El-Dîn reviya nav Kurdên Diyarbekrê û di 628/1321 de, dibe ku ji aliyê yek ji wan hat kuştin (Cuweynî, weşana Muhemed Qezwînî, II, 190; Ibn El-Esîr, XII, 325; d'Ohsson, Histoire des Mongols, III, 62). Cardin di 634/1237 de, Xwarazmiyên mayîn li navçeya Xarpûtê geriyan û wan ew talan kir (Ebûl Ferec, berhem bixwe, 477). Piştî mirina Celal El-Dîn, Mogolan navçeya Diyarbekr û Xilatê talan kir. Komeke hoveke din ji Marga peya bû Erbilê; ev navçeya dawîn sê caran hat talan kirin. Di 645/1245 de, Şehrezor, û di 650/1252 de, Diyarbekir, hatin talan kirin.

ILXANEN MOGOLI

Meriv kêm caran bi Kurdan, di bin Ilxanen mezin de, dibihîse. Ji bo ku ev hakimên ku berê bêol û paşê misilman bûn pêwendiyêñ wan bi Fillan re hebûn, û ku evêñ dawîn gelek gazinan ji hawsîyêñ xwe yên misilman dikirin, Kurdên ku hîn nuh besdarî şerrîn Eyyûbiyan bû bûn diviyan di çiyayêñ xwe de xwe vesêrin û serketina dijminêñ Mogolan hêvî bikin.

Wilayeta "Kurdistan" ku di dema Selçukiyan de ava bû û ku navenda wê Bahar (nêzî-kî Hamadanê) bû, ji aliyê Malik Ibn Tûdan, bavê Amir Çobanê binav û deng, hat vegirtin. Hûlagû, di 655 de ji Hamadanê derket û berê xwe da Begdadê. Li Kirmanşahê, Mogolan kuştin û talan kirin (Reşîd El-Dîn, weşana Quatremère, 225, 255, 267). Berê stendina Begdadê, Hûlagû leşkeran şandin ku Erbilê bistînin. Waliyê vê kelê, Tac El-Dîn Salaba (li Reşîd El-Dîn, weşana Blochet, 261 binêre), xwe xist bin destêñ Mogolan, lê leşkerê kurdi ne xwest ku weka wî bike. Erbil bi alîkariya atabegê Mûsilê, Bedr El-Dîn Lu'lû, hat stendin (d'Hosson, III, 256). Vegirtina Begdadê bû sedema valabûna Şehrezorê, û li gora şehadeta Şîhab El-Dîn Umâri, rûniştevanêñ wê yên kurd gün Sûriye û Misrê (li d'Ohsson, berhem bixwe, III, 309, 330, 337 binêre). Meriv encama (netice) van bûyeran di derketina du êlîn kurdi de li Cezîrê dibîne: Lawêñ û Babîn (Ibn Xeldûn, Hist. des Berbères, wergerandina Slane, II, 461 û III, 413).

Hûlagû vege riya Azarbayanê û di 657 de cardin çû Sûriyê. Li welatê Hekkarî, Mogolan hemî Kurdên ku rastî wan hatin bi şûr kuştin (Reşîd El-Dîn, weşana Quatremère, 328). Paşê, Cezîre, Diyarbekir, Mayyafarqîn (ku ji aliyê El-Melik El-Kamil Nasr El-Dîn hati bû vegirtin) û Mardin hatin stendin. Piştî mirina atabeg Bedr El-Dîn Lu'lû, ku ji Hûlagû re xwebextker (fedakar) ma, lawê wî Salih derbas bû aliyê sultanê Misrê Baybarsê ku ew te'yîn kir. Tavil



Çiyayê Nemrûdê

(di cih de), Kurdên derdora Mûsilê dest avêtin Fillan. Leşkerê Mûsilê, ku ji Kurdan, Tirkmenan û Şûlan ava bû bû, bi mîr-xasî dijî Mogolên ku bi xapandinê bajêr stend xwe ragirt (xwe parazt).

Li Sûriyê jî Kurdan xwe gihad siltanê Memlûk. Baybars, di nama xwe de ji bo Xan Berke pesna jimara leşkerên xwe yên ku ji Tirk, Kurd û Ereban ava bû bûn dida (d'Ohsson, III, 385). Di dema Abaka de, Haytonê Ermenî dibêje çawa, piştî vegirtina leşkerên misrî (berê 677/1278), Mogolan 5000 xaniyên Kurdên (Gordin), ku li Bakurê Sûriyê dijiyan, stendin (Recueil, Documents arméniens, II, 179). Lê piştî şkestina Mogolan di 680/1281 de, beşek ji leşkerên misilman, ku ji Tirkmen û Kurdan ava bû bû, Kîlîkyê talan kir. Di carên kêm de ku Kurd bû bûn hemkarên Mogolan, ew li Farsistana Dûr bû bûn. Di bin Olceytü de, di leşkerên ku di 706 de Gîlanê vegirt de, Kurd hebûn. Hinek şûn de, Kurdekî, Mûsa, ku xwe Mihdiyê Şîyan îlan kiri bû, ji aliyê Olceytü hat kuştin. Di 712 de, Bedr El-Dînê Kurd, serokê Rahba, xwe dijî Mogolan ragirt.

Wilayetên kurdî ji aliyê mîrên mogolî hati bûn hikm kirin. Têkoşîn li Erbîlê ne dirawestiyen. Kayaçi, ku ji çiyayiyine fille ava bû bû û ku beşek ji leşkerê mogoliyê ku li Erbîlê rawestiya bû bû, dijî serokê xwe Zeyn El-Dîn Babî gazinan kirin û dijî Kurdên ku piştâ Ereban digirt derket. Büyerin di 696/1297 de dest pê kir, lê di

710/1310 de gihajtin pileya (derece) bilintirîn. Bi gelek dijwariyan, Mogolan kela ku tê de Fille rûniştî bûn vala kir. Mogolan Kurd anî bûn ku dorgirtina wê xurttir bikin, lê paşê mîrên wan, ku nêzîkî Fillan bûn, xwest ku vanên dawîn bi kar bînin, ji bo ku kuştina Fillan ji aliyê Ereban nehêlin. Kuştin çêbû, lê Kurd beşdarî wê ne bûn (Histoire de Mar Jabalaha III, wergerandina Chabot, Parîs 1895, 152-77).

Navçeya navbera Marga û Erbîlê weka şeqameke (kuçeke fireh) ji bo leşkerên mogolî bi kar dibû. Lê di wê demê de beşek mezin ji navçeya Başûrê Gola Urmiyê ji aliyê Tirk û Mogolan hati bû vegirtin (li Sawc-Bûlak binêre).

Navenda wilayeta "Kurdistan", di bin Olceytü de, ji Baharê hat anîn Siltanabadê (Çamçamal). Meriv kare xerabûna wilayetê ji rehberiya Nuzhet El-Qulûb (107), ku li gora wê hatinên vê navçê bitenê 1/10 ji yên Selçukiyan bûn, bibîne.

Gava ku Ilxanî hunda bûn, du malbat ji serokên mogolî yên êlên Sulduz û Calayir dijminayetî kir. Bi saya paykirina erdan di navbera "her du Hesenan" de (di 783/1338 de), Kurdistan (a farisî) û Xûzistan ji lawên mîr Akraş (?) re vege riyan. Di 784-5 de, Beyazîdê Celayirdî ji xwe re erdekî taybetî (xusûsî) li Kurdistana Farisî û Iraqa Ecemî stend (Lane Poole, berhem bixwe, № 86; d'Ohsson, IV, 747).

Dûmahî heye

NEWROZ

Me îsal Newrozê di salona Claridge de, li Bruxelles, pîroz kir. Weka her sal û weka Newrozên hemî komelên din, ev cêjna netewiya giring xwes û ges bû.

Ciwan û koma xwe stranên gelerî û hel-bestên kurdî bi awakî nuh û bi hogiriya desgehîn "jazz" pêşkes kirin. Dilê nîreva-nan bi vê komê gelek germ û şah bû.

Koma "Kavak" ku ji Flaman û Tirkan pêk hatiye, gelek dîlan û govendên kurdî, bi hogiriya zirne, dembilk û dahol, kirin. Ji sedema dewlemendî û cihêtiya aheng, dîlan û cilêن kurdî - bi hêzanî ku ew ji aliyê ewrupiyan dihatin pêşkes kirin - xelk di

şasî û heyraniyê de ma.

Zyno û Xusrew jî bi stranên geleriyên xwes, yên sivik û giran, xeyala me bir Kurdistanê û deşt, zozan û çiyayîn wê yên bedew bi keser anîn ber cavêne me.

Di rawestê (pauz) de, me diapozitîvên gelek xwesik li ser xweder (tebriet) û cîvaka Kurdistanê, bi hogiriya muzîkê, nîşan dan.

Gelek rêxistinên kurdî û biyanî silav-nameyîn xwe şandin û hin ji wan pirtûkên xwe raxistin.

Pîstî qedana bernamê, herkes bi serbes-tî û germî ket dîlanê.

MERİVÊ NÊANDERTAL

Dİ ŞKEFTÊN KURDİSTANÊ DE

Fuad Hama Xorşîd (*)

PESİGOTIN

Mirovzan (antropolog), arkêolog (ên ku lêkolînan li ser şûnîpeyên "eserên kevnar" çêdikin) û xwediyêñ dozîna (nazariye) pêşveçûnê û rayê (esl) meriv dibêjin ku merivê nêandêrtal, ji aliyê pêpaska (derence) pêşveçûna mirovî, merhela dawîn a pêşveçûna mirovî û ya ku piştî wê merivê froyîn xuya bû temsîl dike. Li gel vê qasê, hin zana bawer dikin ku merivê nêandêrtal rayê ku jê merivê froyîn hatiye temsîl nake, lê ku ew di dema ku tê de celebeke din ku navê wê merivê kromanyon (1) bû bixwe de dijiya û jê pêşveçûyitir bû. Ji bo vê yekê, ew bawer dikin ku, ji sedemên ne naskirî, merivê nêondêrtal di dawiyê de ne ma û merivê kromanyon, bapîrê zayenda (cins) miroviya froyîn, hikm kir.

Bi rastî, isbatêñ ku xwediyêñ vê dîtinê nîşan didin hîn qels in, ji bo ku ew di demeke ku tê de şûnîpeyên merivê nêandêrtal û rehberên (delîl) wî yêş şarî (medenî) kêm bûn û nahêlin ku meriv dîtineke rast li ser cihê wî di pêpaska pêşveçûnê de, heta salêñ 40 ên vê sedsalê de, bêje.

Lê şûnîpeyên ku Dr Ralf Sulki di şkefta Şanîder de, li çiyayê Kurdistanê, di salêñ 1951, 1953, 1956, 1957, 1960 de dîtin, li ser vê pirsê ronyîn nuh avêtin û isbat û rehberên zaniyarî û nêrbarî (konkrêt) li ser vî merivî pêşkes kirin. Bitenê di vê şkeftê de neh heykelên merivê nêandêrtal hatin dîtin. Dudu ji wan mîne û yek ê zarokekî nêandêrtal ê neh mehî ye. Ü tê de celebine bermayıyêñ şarî, weka çek, desgehêñ (alet) kevirî, ariya (xwelî) ku ji êgir maye û hestiyêñ lawirêñ nêçîrê ku bûne weka kevir, hatin dîtin.

■ NEANDERTAL Ü ŞAREYARIYA WÎ

Navê nêandêrtal li ser vî celebê mirovî hat danîn gava ku zanan hestiyê seriyiyê yekemîn ê vî celebî di geliya "nêandêr" de, li navçeya Dusseldorf, li Almanya, dît. Ji

bo vê yekê, her hestiyê seriyî yê vî celebî ku li kîjan aliyê cihanê bê dîtin vî navî bixwe distîne. Ü li ser vê bingehê, navê merivê nêandêrtal ji heykelên ku di şkefta Şanîder de, li çiyayê Kurdistanê, hatin dîtin tê dayîn.

Lê, desgehêñ kevirî ku ev meriv çêkirina wan zanî bû, zanayêñ fransiz ên ku cara yekemîn ew dîtin navê wan kir şareyariya (medeniyeta) mustirî. Ü her desgeheke hunerîye kevirî ku taybetiyêñ (xusûsiyet) vê hunerê bixwe distîne, li ku bê dîtin, bite-nê yan bi heykelên merivê nêandêrtal re, ew hunereke mustirî ye, yan jî şûnîpeyâ (eser) şareyariya mustirî ye. Li ser vê bingehê, merivê nêandêrtal xwediyê şareyariya mustirî ye. Ü ji sedema giringiya eserên şarî (medenî) yêş merivê nêandêrtal li çiyayê Kurdistanê, James Sekner navê "şareyariya mustirî li navçeya Zagrosê" li wan kir, ji bo ku li wira gelek şkeftêñ ku tê de bermayıyêñ şarî yêş merivê nêandêrtal hene: Ji şkefta Şanîder li çiyayê Biradostê heta şkeftê Bîsitûn, Xarıxwar û Erwîsî, nêzîkî Kermanşahê, û şkeftê Kincî, Yafta û Basınkar, nêzîkî bajarê Birocurd li Lûristanê. Ev şkeft bû bûn warêñ eynî dema ku tê de merivê nêandêrtal dijiya û wî ji me re bermayıyêñ xwe yêş şariyêñ wekhev û ku li cihanê bi navê "şareyariya kevirîya navîn li Kurdistanê" hatiye nasîn hîstîne.

■ KINGA MERİVÊ NÊANDERTAL DIJIYA?

Profesor Budros temenê (imr) şareyariya merivê mustirî li Fransa tesbit kir. Li gora wî, ev şareyariî di dema navbera 125.000 û 40.000 sal de hebû. Ji bo vê yekê, bermayıyêñ merivê nêandêrtal ku li cihêñ din ên cihanê hatin dîtin di vê navberê de ne. Gelo berê çend salan bapîrê me nêandêrtal di şkefta Şanîder de, li çiyayêñ Biradostê, û di kîjan rewşan de dijiya?

Li gora lêkolînen ku mutexassisan çêkirin, bicihbûna yekemîn a merivê nêandêrtal di şkefta Şanîder de berê 100.000 salan bûye, û ev meriv li vê navçeyê bi hezaran sal jîna xwe ajot, ji bo ku bermayıyêñ wî yêş din ku ji berê 50.000 heta 46.000 sal

(*) Wergerandin: erebî-kurdî: Pervîn.

(1) Ji bo ku tîpêñ latînî bi erebî basî nayêñ nivîsîn, dibe ku me vî serenavî û navine din çewt nivîne. Em ji xwendevanan hêvî dikin ku ji bo vê yekê me bibuhurin.

hebûn hatin dîtin. Tarîxa dawîn a bermayıyê vî merivî li Rojhilata Navîn berê 33.000 sal bû û di wê demê de şareyariyê bilintir ên merivê bijîr xuya bûn. Hin besên van şareyariyê ku di şkefta Hezar Merd de ji aliyê Doktor Jarud (jin) hatin dîtin bi navê "şareyariya biradostî" hatin nasîn.

Li gora tarîxên jorîn, nêandêrtal li çiyayê Kurdistanê, di zortirînê rewşen iklîmiyê ku bapîrêne me yên pêşin nas dikirin dijiya.

Nêandêrtal, merivê dema kevirî, di rewşen dema qesayî de, û bi hêzanî di dema firmiya qesayî de ku berê 70.000 sal dest pê kir û berê 20.000 sal qediya, dijiya.

■ DEMA QESAYI LI KURDISTANE

Profesor Herbert Right lêhûrnêrinê giring li ser bermayıyê dema qesayî, li çiyayê Kurdistanê, çêkirin û ji wan du teneyê bingehîn weşandin. Emê tecrube bikin ku paşê wan bidin nasîn.

Professor Right şûnîpeyê dema qesayiya dawîna firmî dîtin. Di wê demê de, weka ku me berê got, di şkefta Şanîder de merivê nêandêrtal dijiya. Di vê çaxê de, xêza berfîna hergavî ji dema iroyîn nizmtir bû, bi hêzanî di navbera çiyayê Helgurd û Rawendûzê de (tevî şkefta Şanîder) ew 6000 pî nizm bû. Ev nizmbûn li ser jîna şînayiyî û lawirî, li vê navçeyê, tesîr kir. Di wê demê de, navçeya Rojhilata Navîn weka fro ne zuha bû. Wê gelek baran distend û li ser çiyan berf dibariya, û pileyên (derece) germbûnê jî pirr nizm bûn û ji pileyên iroyîn bi 4-8 tene këmtir bûn. Eger em li van rewşan û li rewşa meriv di dema kevirî de binêrin, em karin bibînin ku di kîjan rewşen iklîmiyê dijwar de ev meriv ji bo hebûna xwe têkoşînê dikir. Weka ku Dr Sulki dibêje, ew bi rastî "xwendevanê rêza (sînif) yekemîn ê xwederê (tebiet) bû".

REWŞA ABORT Û CIVAKI

Di wê demê de, merivê nêandêrtal merhela berhevkirin û nêçîrê dijiya, û ji bo vê yekê, di dema qesayî de ji nêçîrê dijiya. Dibe ku ev meriv di nav komên piçûk de, ku her yek ji wan ji 25 kes ne bêtir bû, dijiya. Ew, di havînê de digeriyan û wan di zivistan û şevê de xwe di şkeftan de diparazt. Celebêñ lawirêñ ku wan nêçîr dikirin ne gelek bûn (li gora bermayıyê ku hatin dîtin). Lê bêtirînê wan pez, gakovî, beraz, kîsöyen hov, hirç, pezkovî, rovî, hechecik û çend celebêñ cirdêñ mezin bûn. Her kom, piştî berhevkirin û nêçîra hevrayî, xwarinê pay dikir. Bi vî awayî, meriv kare bêje ku civak di dema "komunizma bidaî" de dijiya. Ji bo dîtina vê yekê, meriv kare xwe bispêre gotina Dr Sulki li ser encamên (netice) lêhûrnêrinê ku Profesor

Stewart li ser bermayıyê heykelê merivê nêandêrtalê pêşin ku di şkefta Şanîder de dît. Ev lêhûrnêrin rehbera celebê jîna civakî ya koma mirovî ya wê demê ye.

Civaka wan ji dilnermî û qencyiyê ne bêpar bû, ji bo ku ev meriv, di cil saliya xwe de (ji bo merivê nêandêrtal, ev temenekî "imr" pirr mezin e, weka 80 salên merivê iroyîn e), ji awsame (iltihaba cihê girêdana du hestiyân) nexwes dibû û çavê wî yê çepê kor bû. Pişkinêñ (muayene) heykelê wî nîşan da ku milê wî yê rastê û hestiyê sing û sermilê wî ji piçûkayî de pêş ve ne çû bûn. Di ser de jî, şopeke şikestinina di eniya wî ya çepê de heye. Eger ev têr neke, şopeke şikestinekê jî di jorê aliyê rastê yê serê wî de, ku berê mirina wî bi kêm salan derbas bû bû, heye.

Bi kurtî, ev merivê ku arkêolog navê delaliyê yê "nandî" dan wî, ji sedema iklîmê ku tê de heta merivên tebîbi zorê dijîn û xwarinê dibînin, paş de ma bû. Ji bo vê yekê, em bawer dikin ku ev merivê paşdemayî ji aliyê hevalên xwe, heta roja mirina xwe, hat pejirandin (qebûl kirin) û paraztin.

Merhela yekemîn a pêşveçûna civakî ya merivê nêandêrtal di şkefta Şanîder de hat dîtin. Heykelê çaremîn û şeşemîn û zarokê ku di Şanîder de hatin dîtin di nav gulan de hati bûn gor kirin. Loma, Suyki, di pirtûka xwe "Li vira gelê yekemîn ê gulan dijiya" de, çiyayê Kurdistanê nîşan dida. Û di ser de jî, wî digot: "Her meriv ji gulan hez dike, û ji nav van merivan em Kurdên iroyîn ku, di navçeyê de, ji 60.000 sal bêtir, merasîmeke taybetî (xusûsî) çêdikin dibînin".

Ji wan hemî tiştan, meriv kare encam (netice) bistîne ku merivê nêandêrtal hemî hestîn (his) wî yên mirovî, ji paykiranina nêçirê û hezkirinê heta diltenikiyê (şefeqet), hebûn.

■ AWA Û ÇAWABONA NÊANDERTAL

Merivê nêandêrtal, li gora hin hestiyêñ





kêm ên ku hatin dîtin, weka merivekî hov hat nîşan dan; eniya wî berepaşî, stuyê wî stûr, çîpêñ wî xwar, û gava ku direviya xwe dihejand. Lê, lêkolînêñ nuh ên li ser heykelan, piştî pişkîna (muayene) wan ji aliyê mutexassisêñ mirovzaniya xwederî (tebîî), isbat kir ku damezrana serê merivê nêandêrtal bêtir nêzîkî merivê bijîr bû. Heta, piştî ku Profesor Stewart hestiyên stû, sing û ên din ên merivê nêandêrtal ên ku di şkefta Şanîder de hatin dîtin pişkîn kirin û li wan hûr nêrî, encam stend ku cihêtiyên (ferqên) mezin di navbera merivê nêandêrtal û merivê îroyîn tu nene. Û piştî ku wî heykelê çaremin û şeşemîn ê merivê nêandêrtal pişkîn kirin, wî dît ku canê wî nêziktirî canê merivê îroyîn bû.

Loma, gelek mirovzanêñ xwederî îro tekîd dîkin ku merivê nêandêrtal pêşiyê merivê îroyînê ku jê bêtir pêş ve çûye bixwe ye. Û weka ku Profesor Muzaffer Şenyürük, ji zanîngeha Ankarê, dibêje: ew "Şanîderiyê bijîr bûm", ji bo ku ew di vê şkeftê de hatin dîtin. Ev Profesor, bi vî awayî, bitenê dixwaze nîşan bide û tekîd bike ku merivê nêandêrtal (merivekî bijîr bû).

WELATEN DIN EN NEANDERTAL

Bermayiyêñ merivê nêandêrtal û şareyariya wî ya mustirî, di dema qesayî de, di navçeyine cihê de, di cihana kevn (Ewrupa Asywî) de, hatin dîtin: Ji Rojavayê, ango ji Ewrupa û Bakurê Afrika heta Rojhilatê, ango Uzbekistan û nîvîn kit'a Asyê. Bi taybetî, di nav wan de jî navçeya Rojhilate Deryayê Sipî, çiyayêñ Kurdistanê, Filistîn, navçeya Deryayê Reş, Qezwîn û Ural hebûn.

Li Rojhilata Dûr jî (Jawa) û Afrika mîrîdyen (medarî) jî (Rodîzya), ev bermayî hatin dîtin.

Lê, li vira, divê em nîşan bidin ku çiyayêñ Kurdistanê yek ji van cihêñ ku tê de vekirîtirînêñ heykelêñ merivê nêandêrtal û bermayiyêñ wî yêñ şarî (medenî) hatin dîtin. Û dîtina wan dozîna kevn a ku vî merivî hov ditî têk da (xera kir)û dozîneke nuh li ser vî merivê ku bi rastî pêşiyê

merivê îroyîn tê hesibandin danî. Ji bo vê yekê, em bê tereddud pirtûka birayê Wilkram ku wan navê wê kir (Dergûşa miroviyê) û ku di sala 1914 de li ser yek ji navçeyêñ Kurdistanê hat weşandin nîşan didin. Ev pirtûk, eger tê de tu zanînêñ ku di seriya wê de xuya dîbin tu nebin jî, ev eserîn merivê nêandêrtal vê baweriyyê didin me ku çiyayêñ Kurdistanê bi rastî ne dergûşa miroviyê bin jî, ew yek ji cihêñ ku tê de merivê bijîr xuya bû ne.

ÇAVKANI

- 1- Ralf S. Sulki (Şanîder, gelê gulân ê yekemîn), New-York, 1971 (bi ingilîzî)
- 2- F. Clark Hawl (Merivê kevn), New-York, 1965 (bi ingilîzî)
- 3- Georges Rox (Iraqa kevn), London, 1964 (bi ingilîzî)
- 4- Francis Burdos (Dema kevirîya kevn), New-York, 1968 (bi ingilîzî)
- 5- Robert J. Bradod O'haw (Kolanêñ pêş-dîrokî li Kurdistanâ Iraqê), Chicago, 1960 (bi ingilîzî)
- 6- H. I. Right (Tazîkirina qesayî li Kurdistanê), 1962 (bi ingilîzî)
- 7- Muzaffer Şenyürük (Nîşankeke dîn li ser zarokê Şanîder ê dema kevirîya na-vîn), kovara Anadolê, 1957 (bi ingilîzî)
- 8- Ralf L. Bilz (Antropolojiya giştî), wergerandina D. Muhammed El-Jewherî, Cild I, weşana Dar Nahdat Misr, 1976.
- 9- Karlton S. Koon (Çiroka mirov), wergerandina Muhammed Tewfiq Hesen



ALÎKARIYA CIVAKA BİYANIYAN

Derwêş (*)

-||-

NESLE DUWEMİN

Karkerên biyanî ku rastûrê ji welatê xwe têñ, hê girêdayî çanda xwe, ola xwe û merçen jîna xwe yabihurî ne. Lê li ba zarokên wan ku li vira mezin dibin ev tişt xuya nakin. Ew, li xerîbiyê xwe di valayiyekê de dibînin. Di alîkî de, çand, ziman û adetên kevnar ku, li malê, di bin tesîra ol de ne û dijwar in, û di aliyê din de çand û adetên civaka nuh û xwendina bingehî li derdorê wan, ji wan re pirsan çêdikin.

Her roja ku diçe, "em" ji malbat û çanda civakî dûr dikeve. Lê di aliyê din de xortêñ biyanî imkanên pêşveçûnê li xwendegêhî nastînin. Anglo, ew ne wek malbatiyêñ xwe û ne jî wek merovê civaka welatê ku ew lê ne şexsiyeta xwe distînin. Ew yek dibe pirseke giran di jîna xortan de, ji bo ku ew nizanin kîjan şexsiyeta çandî bistînin.

Di aliyê danûstandinêñ bi civaka ku ew lê mezin bûne, ew ji dê û bavêñ xwe baştir in. Zimanê wan xurttir e, dora xwe baştir nas dikin û di aliyê sazendeyan (daire) de kêmter zoriyan dibînin.

Ciwanan ku li welêt bûne û paş re rastûrê hatine vira, wek mezinêñ xwe dijwariyan dibînin. Di aliyê danûstandinêñ rojî de, di xwendegahan de, di aliyê cihgirtinê de (integration) û hwd., ew ji hevalên xwe yêñ ji eynî welatî ne (û herweha ji hevalên xwe yêñ ji welatênuh) bêtir dijwariyan dibînin û kêmter bi ser dikevin. Her tiştê nuh ji wan re biyanî û zor tê. Ev xerîbî û zorî demeke dirêj dewam dike. Ew xwe bitenê û dûrketî dibînin.

Bi kurtayî, di her du alian de jî jîna van ciwanan li welatê biyanî dijwar e. Ew dibînin ku "mal" û "derve" ne wek hev in. Ew "li mal", Tirk, Kurd, Ermenî yan jî Yewnanî ne, lê li derveyî malê ew "Belçikî" yan "Ewrupî" ne.

Dilê mezinêñ zarokan bi vê yekê ne rihet e. Ew difikirin ku zarokên xwe idare bikin. Di çanda wan de ev tişt nîne û ol jî vê yekê xweş nabîne. Malbata ku xwe bi civaka mezin girêdayî dibîne, xwe wek endamek ji civaka li ser bingehî ola Islamê nas dike, ji zarokan re biyanî dimîne û ew oldariya mezin ku li malbatê ye, li ba wan hunda dibe. Pirr caran jî ciwan di nav axaftinêñ

xwe de hember adet û danûstandinêñ hişk yêñ di civaka welatiyêñ xwe de derdikevin û bi her awayî xwe wek hevalên civaka nuh pêşkes dikin: Danûstandinêñ rojî, danûstandinêñ nav keç û kuran, hurmet li ser bingehî şexsî (ne ji bo ku kes jê meztir e) û hwd.

Di aliyê din de jî, gava ku merivekî ji derve (bi piranî eger ew kes ne ji ola islamî be) bi van ciwanan biyanî ra diaxive ew naxwazin bibin xuya kirin ku tişttekî wan bi çand û ola malbata wan ra nema ye. Ew wan tiştîn ku di jîna xwe ya rojî de dikin, li dijî ne, bi dev diparêzin. **Nîşe:** Ew dijî amkolê ne, ji ber ku di ola wan de alkol qedexe ye, lê ew bixwe jî vedixwin. Ew dijî danûstandinêñ cinsî di navbera keç û kuran in, ji ber ku di çand û ola wan de ew tişt guneh e, lê ew vê yekê jî bi hevalên xwe re dikin û hwd.

Keçen biyanî cidabûnêñ çandî û dijwariya wan li ser milen xwe ji lawen biyanî bêtir dibînin. Terbiya ku li mal dibînin ji ya lawan dijwartir e û li derveyî malê ew ji lawan bêtir kontrol dibin. Ew dibînin ku hevalên wan li dibistan, kar û cihen weha ji wan azadtir in û birayen wan di her ali de serbesttir dijîn. Eger birayen wan bi xwazin û di dibistanê de jêhatî bin, ew xwendina xwe berdewam dikin û li nav malê xwedî gotin in. Lê mafen keçan di hemî alian de ji yêñ hevalên wan yêñ civaka welatê biyanî û lawen welatiyêñ wan kêmter in. Piraniya keçen biyanî, di navbera 12 û 16 salî de, mecbûr dibin ku dev ji xwendina xwe berdin û li malê, li ba xuşken xwe, bimîn ku karêñ malê bikin. Paş wî temeni (emr) jî, dê û bavêñ wan haziriya zewaca wan dikin û li xordekî digerin ku keça xwe bidinê. Ew adet, ji bo keçen ku rastûrê ji welêt hatine vira zor e, lê ji bo keçen ku li vira mezin bûne ev tişttekî zortir û girantir e. Ew keçen ku li vira bûne û mezin bûne tev beşekî kêm ji lawen biyanî naxwazin vê yekê di jîna xwe de bibînin, lê ta niha nikarin tişttekî biguherînin.

Ev pirsên ku ciwanan biyanî di nav malbatê de dibînin û nikarin ji wan ra çare bibînin û derdorê biyanî ku imkanen vebûna nav civakê ji wan vedisere, pirr caran dibin sedemên reva wan ji nav malê. Di vê ihtimalê de mezinêñ van ciwanan li wan

digerin û dixwazin zarokên xwe vegeŕînîn malê. Lê gava zarok divegerin ew dîsa bi eynî awayî jîna dijwar derbas dîkin. Paş reva malê, keç ji law hê bêtir dijwariyan dibîne. **Nîşe:** paş revê û vegera malê, pirr ji malbatêni biyanî keçen xwe bi bijîjkan.

(textor) didin kontrol kirin ku ew bizanîn ka ew keç in an bûne jin. Di ihtimala pêşîn de, nûce li derdorê xwe dibêjin ku welatiyêni wan ji gûmanan xelas bibin. Lê çi mixabe ku ev bûyerên weha keçen biyanî ber bi pirsên sosyo-psîkolojîk dibin.

CIWANEN BIYANÎ DI MALEN ALIKARIYÊ DE

Ciwanen biyanî ku ji malê direvin, di malên alîkariyê de bi cih dîbin. Ji hev-peyvînên me ku bi berpirsiyarên van malan ra kirin xuya bû ku dê û bavêni ciwanan vî tiştî tucar qebûl nakin. Gava ku ciwan keç be, hê jî ne xweştir dibe. Eger bi xweşkayî nebe, ew car caran dixwazin ku keçen xwe ji van malan birevînin. Loma, dê û bavêni biyanî qebûl nakin ku zarokên wan ji "biyanîyan" alîkariyê bixwazin, dema ku welatiyêni wan li dora wan hebin. Ji wan re rev û nexweşiyêni din ên di nav malbatê de, karê "hindurî" ye û pêwist e kesek ji derve pê nehise.

Sedema reva ciwanen biyanî hişkbûna bav, carna ya dê, û birayêni ji wan meztir e. Ew revê ji xwe re awakî liberxwedan hesêb dîkin.

Di rewşen weha de, giring e ku karkeren

alîkar, di malen alîkariyê de, bi riya danûstandinên bi mezinên ciwanan re, li lihevhatinê bigerin. Eger ciwan law be giring e ku karker bi awakî nerm xwe bigihîne bav û hin ji dostêni bav ku gotina wan li ba wî dibihere. Eger ciwanê ku reviya ye keç be, divê karkereke jin dîsa bi awakî nerm xwe bigihîne dayika keçikê û bi riya dayikê danûstandinên xwe xurt bike ku çarekê ji pirsê re bibîne. Ev danûstandin ewê di destpêkê de dijwar bin, lê pêwist e ku navbera her du aliyan xweş bibe. Divê hev-peyvîn ne pirr giran û vekirî bin. Ango, divê ew girtî bin û dê, bav û maliyêni din wan negirin ser xwe. Divê karkerê civakî ji derveyî malê nîşe bide û haya wî/wê ji çand û ola malbatê hebe. Lê divê ew ji bir neke ku ew hergav şîretan bike. Ew şîret divê bibin ders ji bo mezinên ciwanê bi pirs. Şîret jî divê, paş ku baweriya ciwanen bazdayî bi karker çêdibe, bibin.



JIN Ü KEÇEN BIYANİ LI XERİBIYE

Wek me di destpêkê de got, jina di civa-ka ola Islamê de ku bi "çanda civakî" tê nas kirin xwedî kêm maf e û di rewşike dijwar de ye. Karê nav malê, anîna zarokan û mezinkirina wan, karkeriya erzan li van welatêni biyanî ji bo anîna diravan ji malê re û hwd. li ser milêni jin û keçen biyanî ne.

Em karin jinêni biyanî li sê besan rêz bikin: Jinêni ji gundan, jinêni ji bajarên biçûk û jinêni ji bajarên mezin. Lê li vira em li ser piraniyê diaxivin. Ev piranî ji ji gundan û bajarên biçûk ku di aliyê aborî de paşmayî û di bin tesîra ol de ne, tê.

Mêrê ji civaka ola Islamê, li welatê biyanî, danûstandinêni xwe bi awakî din, ango ne wek berê, dike. Ew malbata mezin û derdorê fireh biçûk bûne û di civaka nuh de mîr dihise ku rola wî jî biçûk dibe. Nezanîna zimên, xwendin û nivîsandinê kar û barê wî di jîna rojê de zortir dikan. Ji ber wan sedeman, ew hergav xwe ji civaka nuh biyanî dibîne û bi hemî hêza xwe li çand û ola xwe dipêce. Ev rewş jî ji jina biyanî re dijwar e û dibe sedema biçûkbûna şexsiyeta wê û mafêni wê ji yên berê, yên li welêt, kêmter dibil. Ango, xerîbi ji jina biyanî re ji mîrê biyanî xirabtir e.

Dijwariyên ku keç dibînin dibin sedemêne gelek pirsên nav malbatê. Loma giring e ku meriv li hin tiştan bigere ku vê rewşê hinekî bastir bike, ta ku ew hinekî bêtir xwedî şexsiyet û azádî bibin.

Di vî warî de, meriv kare hin cihan bitenê ji bo jin û keçen biyanî û ewrupî ava bike ku ew karibin di nav hev de li ser jîna xwe, danûstandinêni malbatê, civak, integrasyon, zimên û saxiyê biaxivin. Di nav van tiştan de ew dikarin cejnan ji bo xwe û derve, civînêni dawiya heftan û xebata bi hevra (rêvaniya bajarekî, film, muzîk, video, û hwd.) û bi komelêni cida re, wek yên xortan û mezinan, hîn cejnîni bi hevre amade bikin. Eger ev nîşe bi kar bîn, ew dikarin bibin gavek ji bo jin û keçen biyanî ku di rewşâ xwe ya dijwar de pêşveçûnan qeyd bikin.

Pêwist e em vê yekê jî bêjin ku di pîrozkirina cejn û pêkanîna xebatê de besdar-bûna jinêni biyanî li kêleka jinêni ewrupî giring e. Kar û idara ku bêyî tevbûna jinêni biyanî çêdibe, dibe sedema pasifîzm û bêdi-liya wan.

Dûmahî heye

R O M Î Ü Ş İ V A N

Mihdî

Rojeke havînê du romî (candırma) di rî de tî (têhn) dibin. Di çolê da, ji dûrda, şivanekî dibînin. Ew diçin cem wî, avê ji wî dixwazin. Şivan ava xwe dide wan. Piştî ku romî avê divexwin, li nav û nifûsa şivîn dipirsin.

Romî : Bernavê de çi ye?

Şivan: Çoban.

Romî : Rastiyê bêje!

Şivan: Çoban!

Romî li hevdu dinêrin û dibêjin: "Ker kurê kera qesmeriya xwe bi me dike!" û dikevine ser zikê şivîn û bêtirî nîv saet lê dixin, heta ku jê diwestin. Dîsa jê dipirsin:

Romî : Navê te çi ye?

Şivan: Koç (bi kurdî: Beran).

Romî : Hê hisê vî kurikî ne hatiye serê wî!

Dîsa, ew bi piyan û kulman lê dixin heta ku wî bê can dihêlin. Piştî saetekê, hisê şivîn dîsa tê serê wî. Vê carê, destê wî li kelemçê dixin û berê wî didine qara-qola romiya. Li qaraqolê ifada wî distînîn. Serokê romiya ji wan dipirse: "Vî kesî çi kiriye?". Ew jî dibêjin: "Ev kes dijî me hatiye û qesmeriya xwe bi me kiriye"

Li gund muxtar û kurê şivîn karta nifûsa wî dibin û diçine qaraqolê. Li wê derê, li nifûsa şivîn dinêrin. Bi rastî jî bernavê wî "Çoban" û navê wî "Koç" e!!

Lê mixabin, Şivan ji sedema nav û bernavê xwe yên kurdî ku bi tirkî hatin gotin ewqas lêdan xwari bû! Wî hew karî bû weka berê here ber pezê xwe. Ew bi rojan di nav cihan da li malê raket, heta ku laşê wî sax bû.

X E B A T A M E

23 ÇİLE

Bi vexwendina (dawetî) Zanîngeha Aşîtiyê, berpirsiyarek ji Têkoşer axaftinekê li ser Kurdistanê, di dibistaneke belçikî de, li Natoy, nêzîkî Namur, çêkir.

5 SEBAT

Nûnerek ji Têkoşer besdar bû raberiyeke wênekêşen (ressam) îtalî, ku ji aliyê komeila Centro Documentazione Italiani, li Bruxelles, hat pêk anîn.

6 ADAR

Cardin li dibistana Natoy, me axaftinekê, ji bo komeke din a xwendekaran, li ser pirsa Kurd û Kurdistanê çêkir.

9 ADAR

Em besdar bûn Newroza Kurdistan Cultur Centrum li Deventer, Hollanda.

15 ADAR

Newroza Têkoşer, li Bruxelles (li rûpel binêre).

16 ADAR

Newroza Kurdên Arnhem, li Hollanda. Em bi raxistina pirtük û kasetêne kurdî besdarî wê bûn.

17 ADAR

Bi hinceta (munasebet) rojêne Migralia, me li zanîngeha flamanî V.U.B., li Bruxelles, ji katjimêr (seet) 10 heta 18, pirtük û kasetêne kurdî raxistin.

23 OCAK

Barış Üniversitesi'nden isteği üzerine Têkoşer'den bir kişi Namur'a yakın Natoy da bir okula, Kurdistan sorununu anlattı.

5 ŞUBAT

Têkoşer'in bir üyesi Brüksel'de Centro Documentazine Italiani tarafından düzenlenen İtalyan ressamların sergisinin açılış törenine katıldı.

6 MART

Natoy'da yeni bir grup öğrenci için Kürtler ve Kurdistan sorunu anlatıldı.

9 MART

Hollanda'nın Deventer şehrinde Kurdistan Cultur Centrum tarafından düzenlenen Newroz şenliğine katıldık.

15 MART

Têkoşer'in zengin bir program ile hazırladığı Newroz şenliği büyük bir coşku ile kutlandı. Şenlige B. Almanya'dan Ciwan ve Almanlardan oluşan iki kişilik grubu, Fransa'dan Zeyno ve Xosrow, Belçika'nın Anvers şehrinde Flaman ve Türklerden oluşan "KAVAK" folklor ekibi, davul ve zurna eşliğinde katıldılar. Kürt ozanı Ciwan'in muhteşem müziği, Zeyno ve Xosrow'un geleneksel Kürt türküleri, folk-

DI MEHË DE CAREKE

- Civîn bi berpirsiyarek Zanîngeha Aşîtiyê (Université de Paix) û rôexistinîne din ku bi pirsên mafêni mirovan û gelan mijûr dibin re.

- Civîn bi komelêن civakî û çandî ku li şaredariya St-Josse, li Bruxelles, dixebeitin re.

JI ALIYÊ WEŞANE

TELEVİZYON:

Di 13 Adarê de, berpirsiyarek ji Têkoşer, di bernafransızı "Carrefour" de, nêzîkî deh xulek (deqqe) li ser Newrozê peyivî. Pasê, perçek ji filma vidéo "Kîne Em" hat nîşan dan.

RADYOYA AZAD

Her yekşem, ji katjimêr 13 heta 15, bi kurdî, fransızî, tirkî û flamanî.

BROŞUR

Me broşürekê, bi fransızî û flamanî, li ser xebata xwe di sala 1985 de, weşand û şand ji rôexistin û kesen biyanî re.

lor ekibi "KAVAK" in ustaca oynadıkları Kürt oyunları ve davul-zurna'nın etkileyici özellikleri bu seneki Newroz'a katılan seyirci kitlesini şaha kaldırdı. Kitlenin içinde bazı seyirciler de davul zurna eşliğindeki halaylara katılarak geceye bir başka anlam verdi.

Cesitli örgütlerin sergileri ve Kürt yemekleri, Kürt, Türk, Fars, Arap ve Belçika vs. örgütlerinden gelen mesajlar ile Kürt halkın uluslararası bayramı Newroz bu senen de kardeşlik içinde coşku ile kutlandı.

16 MART

Hollanda'nın Arnhem şehrinde çeşitli Kürt örgüt ve şahsiyetleri tarafından düzenlenen Newroz'a kitap ve kaset sergimizin yanında Zeyno'nun eşliğinde Müzik ekibimiz ile katıldık.

17 MART

Migralia günleri dolayısı ile Brüksel Özgür Üniversitesi, (V.U.B.) de saat 10 dan 18 e kadar kitap ve kaset sergimiz ile katıldık.

YAYIN ALANINDA

TELEVİZYON
Têkoşer'den bir temsilci 13 Mart'ta RTBF' in "Carrefour" programında on dakikaya yakın bir sürede Newroz üzerine konuştu. Programın sonunda Şivan'ın "Kî ne em" filminden bir parça yayınlandı.

